**DÎROKA ZIMANÊ KURDÎ VEDIGERE NEH HEZAR SAL BERÊ/Cemal Encarî**

Bêguman dema em qala zimên dikin, rasterast peyvendiya wê bi çand û wêjeya wî zimanî jî heye. Ew hevtemamkarên hev in ango dunyabînîya wan sazkarên hev in. Ziman bandora xwe dasaz dike li ser çand û wêje, her weha çand û wêjeyê jî bandora xwe li ser zimên dasaz dike. Bi vî awayî eger em bixwazin zimanekî nas bikin, divê çand û wêjeya vî zimanî jî nas bikin û eger em bixwazin çand û wêjeya wê nas bikin, divê zimanê wê çand û wêjeyê jî nas bikin. Ziman, çand û wêjeya Kurdî cuda ji her ziman, çand û wêjeyên din ên dunyayê, xwedî gelek pêvan û taybetmendiyên xwe ye ku baldarî û hestyariyeke zêde jêre pêwîst e û em dikarin bibêjin: kesekî ku pir kûr neçe, nikare kod û felsefeyên wê jî baş nas bike. Zimanê Kurdî ji Zagrosê hetanî Sumer û vir de û hetanî îro, jêderka gelek çand û wêjeyên kûr û hûr e. Girêdayî felsefeya Mîtrayî û rewtên hizirî ye. Lew bi taybet çandyar û wêjeyarên Kurd, divê berî her tişt zimanê Kurdî weku kod û felsefeyên wî baş nas bikin, înca şîkar û xebatên xwe li ser çand û wêjeyê bikin. Ev lêkolînên zanistî û şahane, ji bo me Kurdan cihê dilxweşî û di heman demê de şahnaziyê ye ku zimanê Kurdî bi awayekî zanistî û lêkolînên zanistî weku maka zimanên Hînd-Ewropiyan hatiye selmandin. Di vê ev lêkolîn û çendîn lêkolîn din jî ku hene bibin sedema ku em li rastî, resenî û heqîqeta xwe vegerin û bi bîrdozî, kod û çavên Kurdî li rastiyên xwe binêrin û bikolin, NE bîrdozî û xêz-tieoriyên felan xelk û felan kesî. Zimanê Kurdî, çand û wêjeya Kurdî du caran pêşneg, rewşenbîr û pênûsmendên me erkdar dikin, careke weku mijarên heyî, careke din jî weku taybetmendî, kevnarî, zengînî û rengîniya wê ku tîrêjên xwe gihandiye ziman, çand û wêjeyên gelek derên din jî.
//Qendîl Şeyxbizînî

Li gorî lêkolîna di kovara “Sayêns (science)”ê de hatiye weşandin, lêkolerên Nîwzlandî ragihandine:

Indo-European languages ango,malbata zimanên Hînd-Ewropiyan nû û modern xwedî dîrokeke heşt bo neh hezar û pênc sed salî berê ye,di herêmekê de ku îro navê tirkiyeyê li ser e û têde zimanê Kurdî jî mîna yek ji zimanên Hînd-Ewropiyan di rêzê de ye ku xwedî dîroka heşt hezar sal zêdetir e û di kêleka çend zimenên din weku kevintirîn zimanê dunyayê navê wî hatiye. Li gorî belgeyan herêmê bakurê Kurdistanê jî ku di ragahîyan de bi Anatolia navê wê hatiye, weke herêma serhildan û kanîya zimanên Hînd-Ewropîyan hatiye dîtin.

Weşana vê lêkolînê di kowara“Sayêns (science)”ê de giringiya bêhtir dide vê mijarê, heta niha dihate gotin ku zimanê Hînd-Ewropîyan vedigere pênc hezar sal berê, serhildan û kanîya wê jî vedigere herêmên bakurê Xezerê, lê lêkolîna zanîngeha Nîwzlandayê vê yekê red dike û diyar dike pajeke mezin ji axa vê erdê ku niha navê Tirkiyeyê li ser e, kanî û jêdera zimanên Hînd-Ewropîyan e, li gorî belgeyên ku hatine belavkirin, vê rastiyê jêl dikin holê ku zimanê Kurdî û herêma başûrê rojhilata tirkiyayê ango bakurê Kurdistanê jêdera serhildana zimanên Hînd-Ewropîyan e û zimanê tirkî ku niha zimanê dewletê ye, ti peyvendiyeke wê bi malbata Hînd-Ewropîyan ve nîne.

Malbata zimanên Hînd-Ewropîyan xwedî gelek peyvên hevbeş û wekhev in, ev jî nîşande ye ku hemû zimanên Hînd-Ewropiyan xwedî yek jêder in, wan wekhevî di peyvan de weha kiriye ku gelek zimanên cur bi cur xwe di nava girohekê de bidozin û ava bibin. Îro zimanên zînde yên dunyayê bi ser çend girohan pajbûne ku zimanên Hînd-Ewropiyan yek ji giringtirîn û mezintirîn girohên vê pajbûnê yên zimanî ne.

Di tazetirîn lêkolîna zanistî yên lêkolerên Okland a Nîwzlandayê bi navê **“Mapping the Origins and Expansion of the Indo-European**


**Language Family”** ronahî dide ser reh û çavkanî û geşekirinên Malbata zimanên Hînd-Ewropiyan û bîrdoziyeke taze jêl dike ku zimanên Hînd-Ewropiyan di herêma  Anatolia de dêbûne û kaniyê wê Anatolia û bakurê    Kurdistanê ye.

Ev koma zanayan bi serdariya Dr. Kuîntîn Atkînson “Dr. Quentin Atkinson”şêwazeke nû ji lêkolînên xwe re daşan kiriye ku bi **“Fîlojênêtîk”** navdêr e. Şêwazeke ji bo dozîna reha jênêtîka vîrusan tê bikaranîn.

Dr. Quentin Atkinson serdarê koma lêkolerên zanistan a “Okland”ê dibêje: şêwazên ku me bikaranîne vedigere ji bo “Epidemiology” û jênasîya gûran. Her ew şêwazên jênasana ku ji bo dozîna vîrusan tê bikaranîn di jiyan û jîngehê de.

Ew bi hilsengandina “DNA”yê ya vîrus û wekheviyên wan, şecernameya vîrusan amade dikin heta bizanin ew vîrus ji kû ve hatine, me ev şêwaz ji bo dozîna jêdera zimanên Hînd-Ewropiyan bikaraniye, ango li dewsa em lêkolînê l’ser vîrusan bikin, me lêkolîn l’ser zimên kiriye û li dewsa DNA’yê jî me lêkolîn l’ser peyvên nava zimên kiriye.

Zimanên Hînd-Ewropiyan ji 400 zimanan pêk tên ku paj bûne ser 60 welatên cuda û zimanê tirkî ne têde ye, ew beşeke ji zimanê mongolîya Asya navîn.




***Pexşbûna zimanên Hînd-Ewropiyan û cihên serhildana vê malbatê li bakurê Kurdistanê***

Dr. Quentin Atkinson di derbarê zimanê tirkî de dibêje: zimanê tirkî yê stanbolî beşeke ji zimanên Altayî yên Asya Navîn. Lê zimanên Hînd-Ewropiyan ku di herêma Anatolia dêbûne û bi dirêjaniya dîrokê paj bûne ser girohên biçûk biçûk û bi komxelkan re cihguher bûne. Lê zimanê tirkî vedigere çar sed sal berê ku niha li Anatolia tê axaftin. Lê zimanên Hînd-Ewropiyan vedigere neh hezaran sal berê û şûnde ku lêkolînên me nîşandane û serhildan û jêlbûna wê jî Anatolia anku bakurê Kurdistanê ye.

***Zimanê Kurdî li kêleka wan zimanên ku dîroka wan vedigere heşt ta neh hezar sal berê***

Dr. Quentin Atkinson bawermend e ku lêkolîna wan xwedî belgeyên b’hêzbûne ku gihiştine vê encamê, her di vê derbarê de dibêje: di her pajeke zanistî de li gorî belgeyên çengdariyê dibe ku nêrînên cur bi cur jê re hebin ango kesanek razî û kesanek jî nerazî bin, me agahiyên mezin l’ser peyvên zindî yên malbata zimanên Hînd-Ewropiyan kom

kirine û modelek ê geşedariyê reçav kiriye, ew model û peyvên hevbeş û wekhev kanî û jêdera wan vedigere Anatolia “bakurê Kurdistan” û dîroka wê vedigere neh hezar sal berê.

Ew şêwaza ku vê girohê l’ser lêkolîn kirine, hê bîr û baweriya pirraniya zimannas û bîrmendan qanî nekiriye, lê weke çangdariyeke mezin tê pesnkirin, l’gorî dîrok û navê zimanên kevnar, bi zelalî hatiye jêlkirin û eşkarekirin ku zimanê Kurdî yek ji wan zimanên kevnar ên dunyayê ye.

Zimanê Kurdî yek ji wan zimanên Malbata Hînd-Ewropîiyan e û ligel zimanên din ên vê malbatê xwedî gelek peyvên hevbeş û wekhev in, giringî û bayexa vê lêkolînê, vê yekê ji me re diyar û zelal dike ku zimanê Kurdî li bal me kêmtir ji aliyê zanistî ve hatiye lêkolîn û şîrovekirin, di demekê de bakurê Kurdistanê kanî û cihê serhildana pirraniya wan zimanan e ku niha têne axaftin.

**Cemal Encarî**
**Werger: Qendîl Şeyxbizînî**